



BUROYA KURDÎ **ya Pêwendî û Agahdariyê**

Bultena agahdariyê N° 57 - Çile 2010
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be kurdishbureau@scarlet.be

XEBATA BUROYA KURDÎ

KANÛN 2009

KONFÊRANS



20.12.2009 : Dîroka Kurdistanê (dûmahîk) – sedsala 19mîn

Dîrokzan Wezîrê Eşo dîroka serhildanên kurdî di sedsala 19mîn de ajot (dewam kir). Piştî hilweşana serhildana Mîr Bedir Xan Beg di 1847 de, sedemên serhildanên nuh li dijî Tirkiya Osmanî bêtir bûn. Dewletê li ser rûniştevanên kurd bacên (taks, zerîbe) giran ferz kirin û zilaman bi zorê civandin, ji bo ku wan bixe leşkerê osmanî.

Xurtbûna pelixandinê li dijî sîvîlên kurd serhildaneke nuh, a pismamê Mîr Bedir Xan, Yezdan Şêr, afirand. Vê serhildanê ji dawiya 1854 heta Nîsan 1855 ajot. Ew di heman (eynî) dema şerrê ku navê wî “Şerrê Rojhilatê” bû û ku ji 1853 heta 1856 hati bû kirin de, bû. Di vî şerrî de, Ingiltere û Fransa hevalbendên Tirkiyê bûn. Rûsan Tirkiye li eniya Qefqasiyê şikand û navçeyên Qers, Bazîd, Serhed ... vegirtin (işgal kirin). Yezdan Şêr hêvî dikir ku Rûsya piştgiriya wî bike. Lê, ji sedemên cihê, ev piştgirî jê re ne hat kirin. Wî navçeyên Botan û Hekarî kiri bûn navenda serhildana xwe, sînorên xwe heta Kurdistanê Iraq û Sûriyê ya nuha fireh kiri bûn û dixwest ku Wan û Erzurûmê rizgar bike. Piştî xwekişandina Rûsan, Osmanîyan hemî hêzên xwe avêtin ser vê serhildanê. Bi ser de jî, konsulê ingilî li Mûsilê çend serokên êlên (eşîr) kurdî şandin Tirkiyê û ew li dijî Yezdan Şêr rakirin. Evê dawîn neçar (mecbûr) bû ku xwe li Qesra Gêlî, li Başûrê gola Wanê, xwe veşêre. Konsulê ingilîz jê re da bawer kirin ku eger ew ji kelê derkeve, ewê konsul xwe bixe navbera wî û Tirkan. Lê wî ew radestî (teslîmî) wan kir. Tirkan ew li Istanbulê xist zîndanê.

Sedemên bingehî yên vê şkestinê newekheviya hêzên serhildanê û yên imperatoriya osmanî, nebûna piştgiriyeke ji derve, û nemaze nebûna yekîtiya Kurdan bûn.

ENCAMA XEBATA BUROYA KURDÎ DI 2009 DE

1- Xebata rojane, ji Duşemê heta Înê, katjmêr 9 – 17 :

- Alîkariya civakî (service social)
- Fêrên ziman
- Pirtûkxane û mêdyatêk
- Dyaloga di navbera nifş û çandan
- Sekretarya
- Nivîsîn û wergerandina bultena mehane ya agahdariyê
- Pêwendî û rasthatin bi kes, rêxistin û sazandeyên ku bala xwe didin Kurdan û derhatiyan (koçber)

2- Çalakîyên mehane :

- Bultena agahdariyê : 10 hejmar : N° 47 (sênehî) û 48-56 (mehane), bi çar zimanan : kurdî, fransî, hollandî û inglîzî.
- Konfêrans : 12 (10 ji aliyê Buroya Kurdî û 2 ji aliyê rêxistinên beljîkî hatin pêk anîn).

3- Çalakîyên salane :

- Newroz : koftêl (rêşepsyon) li Buroya Kurdî
- Fîlmek, û piştê gotûbêj, li ser derhatîbûnê.

4- Çalakîyên ku bi hevkarîya rêxistinên din hatine pêk anîn :

- Wergerandin bi têtêfonê û carna li ciyên daxwaz, bi hevkarîya rêxistina Bruxelles-Accueil, ji bo Kurd, Afxanî û Îraniyan : 695 car.
Piraniya van wergerandinan ji aliyê Zarîf Nikraweş, ji Kurdistana Îranê, hatin kirin.
- Xurîniya (xwarina serê sibê) Cihanî. Pêkanîn : rêxistina Citizenne.
- Roja Dyalogê. Pêkanîn : Foyer
- Interliteratour, rojê wêjeyî (edebî). Pêkanîn : 4 weqfên flamanî.
- Fêstivala Şîraniyê. Pêkanîn : Masereelfonds û De Markten.

5- Hevpeyvîn û gotar di kovaran de : 6

6- Beşdarbûna çalakîyên ku ji aliyê rêxistin û sazandeyan hatine pêk anîn : 34

(Konfêrans, rojên lêgerînê, şevên çandî ...)

NÛÇE JI KURDISTANÊ

KANÛN 2009

KURDISTANA TIRKIYÊ

ENSTITUYA ZIMANÊN ZINDÎ LI MÊRDÎNÊ

Di 01 Kanûn 2009 de, encumena wezîran biryara zanîngeha Artuklu li Mêrdînê ku „Enstituya Zimanên Zindî“, ji bo hînkirina kurdî, farisî, erebî suryanî, veke pejirand (qebûl kir).

Di destpêkê de, vê zanîngehê vekirina « Enstituya Kurdî » xwesti bû. Lê encumena perwerda bilind „YOK“ navê “Enstituya Zimanên Zindî” xwest.

(netkurd.com, peyamner.com, pukmedia.com, kurdistan-news.net, rudaw.net, 01.12.2009)

BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ

Di 02 Kanûn 2009 de, topxaneya tirkî navçeyên sînorî yên Nihêl û Nêrwe Rêkan, yên qezayê Amedî, li Kurdistanê Iraqê, bombe kirin.

Berpirsiyarê hêzên ewlehiya (emniyet) sînorî ya parêzgeha (wilayet) Duhokê, Huseyn Temer, ji ajansa PNA re daxuyand ku gundên Sêrî û Reşave, yên navçeya Nihêlê, û gundên Zêwe, Sernî û Bêbû, yên navçeya Nêrwe Rêkan, hatin bombe kirin.

(peyamner.com, 02.12.2009)

Di 27 Kanûn de, heman topxane navçeyên Nêrwe û Rêkan, ku girêdayî Amedî, parêzgeha Duhokê ne, bombe kirin. Û wê gundên Reşave, Zilyê, Sêrî û geliyê Reşavê, yên navçeya Dêrelûkê, bombe kirin.

(pukmedia.com, peyamner.com, 27.12.2009)

KLAVYA KURDÎ

Di destpêka Kanûn 2009 de, li bazara Diyarbekirê klavyeyên pêşîn ên kompyûteran, ku bitenê tê de tîpên (herf) kurdî hene, xuya bûn. Ev klavye ji aliyê şirketêke êlêktronîk a Hong-Kongê, bi alîkariya şirketêke tirkî, hatiye çêkirin.

Pêşkêşkerê vê klavyê daxuyand ku wî klavyeyek pêşkêşî serokwezîrê tirk, Recep Tayyip Erdoğan, kir.

(mediakurd.com, 03.12.2009)

PARLEMENTEREKÎ SKOTLANDÎ ZIMANÊ KURDÎ DIPARÊZE

Di 04 Kanûn 2009 de, endamê parlamenta skotlandî (Herêmeke Brîtanya Mezzin), Dr Bill Wilson, daxuyand ku wî pêşniyareke parlementerî „motion“ kiriye û tê de bangî Tirkiyê kiriye ku mafan bide

Kurdên ku ji bo ku zimanê xwe li ciyên vekirî bi kar tînin tîn pelixandin.

(rudaw.net, 04.12.2009)

XWENDEKAREK DI XWEPÊŞANDANEKÊ DE TÊ KUŞTIN

Di 06 Kanûn 2009 de, xwendekarekî kurd ê 23 salî, Aydın Erdem, li nexweşxaneyêke Diyarbekirê, piştî pevçûnên bi polîs re, mir. Ev yek di dema xwepêşandaneke (meşîn) protêstokirina mercên xerab ên zîdana serokê PKKê, Abdullah Öcalan, de. Öcalan, tevî 5 girtiyên din, hatiye birin zîdaneke nuh (li bultena me ya buhurî binêre).

Xwepêşandanên weha li sê bajarên din ên kurdî û li Istanbulê jî bûn, piştî ku parêzerên (avukat) Öcalan ji hucreya wî ya nuh gazin kir û got ku a kevn mezzintir û xweştir bû !

(CNN Türk, malperên kurdî, 07.12.2009)

OBAMA PIŞTGIRIYA „VEBÛNA KURDÎ“ DIKE

Di 07 Kanûn 2009 de, di dema rasthatineke serokê amerîkî Barak Obama bi serokwezîrê tirk Recep Tayyip Erdoğan li Saraya Sipî de, Obama piştigiriyê ramyariya (siyaset) „Vebûna Kurdî“ ya hukûmeta tirkî kir. Û wî got jî ku tevgerên leşkerî tenê li dijî PKKê têr nakin, lê divê ku çarêke ramyarî bê dîtin.

(netkurd.com, Hürriyet, Milliyet, 07.12.2009; nefel.com, rizgari.org, peyamner.com, 08.12.2009)

XWESTINA DERXISTINA PARTIYA „CHP“Ê JI ENTÛRNASYONAL SOSYALÎST

Di 08 Kanûn 2009 de, 7 rêxisinên kurdî û elewî li Ewropa nameyek ji serokê Entêrnasyonal Sosyalîst û partiyên ku endamên wê ne re nivîsî û tê de ji wan xwest ku partiya sosyal-dêmkokrat a tirkî, CHP, ji vê Entêrnasyonalê derxînin.

Wajoker (imzaker) dibêjin ku di 10 Teşrîn 2009 de, di dema giftûbêjên (munaqêşe) li parlamenta tirkî li ser pirsê kurdî û dêmkrasîyê de, berdevkê koma CHPê, Onur Önen, got ku ramyariya (siyaset) ku serhildanên kurdî yên Şêx Seîd, Dersîm, Agirî û Zilanê pelixand divê ku bajo (dewam bike).

Di vê namê de, rêxisin dibêjin ku 28 serhildanên kurdî di dema ku tê de CHP li desthilatê (hukm) bû de bûn,

ku hemî bi awakî hov (wahşî) hatin pelixandin û ku tê de ji milyonek kes bêtir mirin.

Navên van rêxistinên wajoker ev in : Konfêdêrasyona Rêxistinên Kurdî li Ewropa (KOMKAR-EU), Fêdêrasyona Rêxistinên Kurdistanê li Swêdê, Mala Gel li Jenêvê, Navenda Çandî ya Elewîyan li Göttenborgê, Yekîtiya Jinên Kurdistanê (KOMJIN), Yekîtiya Cuhane Kurdistanê (KOMCIWAN), Rêxistina Karkerên Kurdistanê li Hamburgê (HEVKARÎ).

(mediakurd.com, 10.12.2009)

VEKOLÎN : DTP PIRANIYA KURDAN TEMSÎL NAKE

Vekolînek (ankêt) li Navenda Lêgerînên Stratêjîk li Zanîngeha tirkî ya Bahçeşehirê, li bin birêvebiriya Prof. Dr. Ercan Çitloğlu, hat kirin. Ji 28.000 kesan ji Kurdistanê Tirkîyê li ser nimûnendetiya (temsîlkirin) partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê, pirs hatin pirsîn : 23.5% got ku ew Kurdan dinimîne (temsîl dike), 29% bê dîtî (fîkr) bûn û 47% got ku ew bawer dikin ku ev partî nekare wan binimîne.

(mediakurd.com, 10.12.2009)

PARTIYA DETPÊ TÊ QEDEXE KIRIN : PARLEMENTERÊN KURD XWE DIKÎŞÎN

Di 11 Kanûn 2009 de, serokê Dadgeha Desturî ya tirkî, Haşim Kılıç, di konfêranseke çapemeniyê de biryara vê dadgehê li ser qedexekirina partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê, û ji 37 endamên wê re, ku ji wan serok Ahmet Türk û hevserok Aysel Tuğluk, 5 sal qedexekirina siyasetê daxuyand. Wî got ku sedema vê yekê ew e ku DTP girêdayî rêxistina têrrorist PKKê ye û ku ev yek li dijî yekbûna dewletê ye.

Ev biryar hefteyek piştî kuştina 7 serbazên (esker) tirkî ji aliyê PKKê, li Tokatê, hat stendin. DTPê jî tavil daxuyand ku ewê li bal Dadgeha Ewropî ya Mafên Mirov li Strasburgê gilî bike û bi sedan Kurd li kuçên bajarên cihê riswa (protêsto) kir û bi polîs re pevçûn çêbûn. Hin ji wan ji aliyê cuhanên tirk ên faşîst bi çekan hatin êrîş kirin. Li Mûşê, di pevçûnên bi polîs de 2 kes mirin û 6 jî birîndar bûn.

Girtina DTPê nerazîbûna Kurdên Tirkîyê, hukûmet û parlamenta Kurdistanê Iraqê derxist. Xwepêşandan (meşîn) li Kurdistanê Iraqê bûn. Yekîtiya Ewropî û Amerîka dilgiraniya xwe (xemgînî) ji bo vê girtinê got.

Di 14 Kanûn de, di konfêranseke çapemeniyê de, kommisêrê ewropî ji bo firehkirinê, Olli Rehn, daxuyand ku ew li ber xwe dikeve ku DTPê xwe ji PKKê dûr ne xist.

Di 15 Kanûn de, 20 parlementerên DTPê daxuyand ku ew xwe ji parlamentê dikişînin. Di heman (eynî) rojê de, serokwezîrê tirk, Recep Tayyip Erdoğan, daxuyand ku ew li dijî girtina vê partiyê ye û got ku Tirkîyê bûye goristana partiyan : « *Îro partiyek tê girtin, sibê yeke din li ciyê wê vedibe. Loma pirs bi girtina partiyekê çare nabe ...* ».

(Ajansên çapemeniyê, çapemeniya tirkî, TV û malperên kurdî, 11-16.12.2009)

Di 16 Kanûn de, serokatiya swêdî ya Yekîtiya Ewropî dilgiraniya xwe ji bo vê biryara ku rê li ber ramyariyên (siyasî) kurd ên hilbijartî digire daxuyand. Û wê got jî ku Yekîtiya Ewropî ji Tirkîyê, welatekî nêzîkî wê û ku pê re pêwendiyên wê hene, dixwaze ku guherandinên girîng di zaona (qanûn) xwe ya li ser partiyên ramyarî, li gora pêşniyarên Konseya Ewropî û Peymana Ewropî ya Mafên Mirov, bike. Li dawiyê, daxuyanî balan dikişîne ku Yekîtiya Ewropî hergav çavdêriya rewş û pêşveçûna Tirkîyê dike.

(eurokurd.net, avestakurd.net, 17.12.2009)

Di 17 Kanûn de, wezîrê tirk ê hundir, Beşir Atalay, konfêranseke çapemeniyê li wezaretê xwe pêk anî û tê de got ku « *vebûna kurdî* » û di heman demê de ewê têkoşîna li dijî yên ku tundiyê (şiddet) bi kar tînin bajo (dewam bike). Ew li ser imkana guherandina zagona li ser partiyên ramyarî peyivî û got ku ewê ev babet li parlamentê bê giftûbêj (munaqêşe) kirin.

(nefel.com, 17.12.2009)

LI SER DAXWAZIYA ÖCALAN, PARLEMENTERÊN KURD VEDIGERIN PARLEMENTÊ

Di 18 Kanûn 2009 de, serokê DTPê, Ahmet Türk, konfêranseke çapemeniyê li Diyarbekirê pêk anî û tê de got ku li ser daxwaziya gelê kurd, rêxistinên civaka sîvîl ên vê partiyê, hevalên demokrat ên tirk, ronakbîr û akadêmîkan, û li ser xwestina Abdullah Öcalan, serokê PKKê, ewê parlementerên partiya DTPê vegerin parlamentê.

(netkurd.com, Hürriyet, peyamner.com, pukmedia.com, rudaw.net, aknews.com, 18.12.2009)

Piştî vê yekê, balyozê (sefir) amerîkî li Ankara, James Jeffrey, û balyozên welatên cihê yên Yekîtiya Ewropî, Ahmet Türk ji bo vê biryarê pîroz kir.

(rizgari.org, 21.12.2009)

Di 21 Kanûn de, encumena tawanên (sûc) medya vekolînek (ankêt) li ser Ahmet Türk, li ser bingeha bend 215 a zagona cezayî, test pê kir, ji bo ku wî got ku « *Mîrza Öcalan* » xwekişandina parlementerên DTPê ne pejirand (qebûl ne kir).

(Hürriyet, netkurd.com, 22.12.2009)

DTP NAVÊ XWE DIGUHERÎNE : DIBE « BDP »
Li Diyarbekir û Ankarê, berpirsiyarên DTPê pankarta partiya qedexekirî bi ya « BDP »ê (Barîş ve Demokrasi Partisi) « Partiya Aştî û Dêmkirasîyê » guherand.
(netkurd.com, Hürriyet, peyamner.com, pukmedia.com, rudaw.net, aknews.com, 18.12.2009)

1562 KES JI SEDEMA ÖCALAN TÊN RAGIRTIN

Li gora wezîrê tirk ê hundir, Beşir Atalay, 1562 kes di xwepêşandanên riswakirinê li dijî mercên (şart) xerab ên girtina serokê PKKê, Abdullah Öcalan, de hatin ragirtin. Piştî, li ser biryara dadgehê, 363 kes ji wan hatin zîndan kirin û yê din hatin azad kirin.
(netkurd.com, 18.12.2009)

DANIŞMENDÊ BERÊ YÊ SEROKWEZÎRÊ TIRK LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 19 Kanûn 2009 de, Mir Mehmet Firat, danişmendê (muşawir) berê yê serokê tirk Recep Tayyip Erdoğan û parlementerê kurd ê partiya hukûmî AKPê, çû seredana serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî. Wî jî re dilniya (te'kîd) kir ku serokwezîrê tirk di tecrubeyên xwe de ji bo çarekirina pîrsa kurdî li Tirkîyê, li dijî girtiya partiya DTPê, ciddî ye. Û wî got jî ku ew hêvî dike ku hemî alî, nemaze hukûmeta Kurdistanê Iraqê, piştgiriya tecrubeyên wî bikin. Mîrza Berzanî pesna merdbûna hukûmeta tirkî ya îro da û dilniya kir ku pîrsa kurdî, bitenê bi awayê ramyarî (siyasî), ne bi şerr, dikare bê çare kirin.
(Kurdistan TV, peyamner.com, rudaw.net, netkurd.com, avestakurd.net, nefel.com, rizgari.org, aknews.com, kurdistan-news.net, 19.12.2009)

WEZÎRÊ HUNDIR LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 21 Kanûn 2009 de, piştî seredana Bexdadê, wezîrê hundir ê tirk, Beşir Atalay, çû Kurdistanê Iraqê û rastî serok Mesûd Berzanî, wezîrê kurd ê hundir, Kerîm Sincarî, û kesahiyên (şexsiyyet) ramyarî yê din hat. Ev yek ji bo giftûbêjkirina "vebûna kurdî" û tecrubekirina dîtina çareyekê ji pîrsa PKKê re.
(peyamner.com, 21.12.2009 ; Hürriyet, 22.12.2009)

NAVÊN KURDÎ, ERMENÎ Û SURYANÎ JI KUÇEYÊN DIYARBEKIRÊ RE

Di 21 Kanûn 2009 de, şaredariya (belediyye) Sûrê ya bajarê Diyarbekirê navên kurdî, ermenî û suryanî dan sê kuçan : Amed Arif (helbestvanekî kurd), Migfirdîç (nivîskarekî ermenî) û Naum Faik Palak (suryanî). Abdullah Demirbaş, şaredarê Sûrê ji bo navê Naum Faik Palak got ku divê ku li benda biryara wezaretê karên derve bê mayîn, ji bo ku bê vekolîn ku netewahiya (cinsiyyet, kimlik) wî tirkî bû.
(netkurd.com, rizgari.org, 22.12.2009)

80 KES JI « BDP »Ê TÊN RAGIRTIN

Di 24 Kanûn 2009 de, di tevgera polîsî ya mezzin de, 80 endamên partiya kurdî ya nuh BDP (a ku ciyê DTPya girtî stend), ku ji wan 10 şaredar, li 11 parêzgehê (wilayet) hatin ragirtin. Ji van şaredaran, ê şaredariya Sûrê, Abdullah Demirbaş. Xwepêşandan û çalakîyên (xebat) riswakirinê (protêsto) yê girseyî (kitleyî) yê Kurdan li herderî bûn.
(Tvyên kurdî, netkurd.com, avestakurd.net, aknews.com, nefel.com, rizgari.org, peyamner.com, azady.nl, pukmedia.com, 24.12.2009 ; Eu Turkey Civic Commission, 26.12.2009)

38 ENDAMÊN DIN ÊN BDPÊ TÊN RAGIRTIN

Ji 25 heta 27 Kanûn 2009, 38 endamên din en "BDP"ê li 3 parêzgehên kurdî hatin ragirtin.
(netkurd.com, 27.12.2009)

GIRTINA DTPÊ DI ROJNAMA FERMÎ DE DERKETINA LI BER DADGEHÊ

Di 31 Kanûn 2009 de, qedexekirina partiya kurdî « DTP »ê di rojana fermî (resmî) ya tirkî de hat weşandin. Sedemên bingehî yê vê grîtinê pêwendiyên bi PKKê re û tehdîdkirina yekbûna dewlet û netewe ne.

Tavil (pîrr zû) piştî vê weşandinê, serokê vê partiyê û serokê koma wê li parlamentê, Ahmet Türk, û heveserok û parlementera wê, Aysel Tuğluk, bi hogiriya parêzerê (avukat) xwe Nuri Özmen, derketin ber dadgeha Ankarê.
(Hürriyet, netkurd.com, 31.12.2009)

ZAROKEKÎ KU JI ENFALÊ KUTAH BÛYE TÊ DÎTIN

Di 10 Teşrîn 2009 de, wezîra Şehîd û Enfalkiriyan a hukûmeta Kurdistanê Iraqê, Çinar Seîd, di konfêranseke çapemeniyê li Hewlêrê de daxuyand ku cuhanekî kurd ê 21 salî, Elî, ku ji nijadkujiya Halabca ya bi çekên şîmîk di 1988 de, dema ku ew 4 mehî bû, kutah (xelas) bûye, bi saya têtên tîbbî yê ADNê hatiye dîtin. Roja bombekirina Halabçê, bav û 5 xuşk û birayên wî miri bûn. Diya wî ne li malê bû. Elî (navê wî yê rast Zimanko Muhammed de) ji aliyê malbateke faris li Meşedê, li Îranê, hat xwedî kirin.

Di 03 Kanûn 2009 de, Elî bi merasîmeke taybetî li ber peykerê Halabca hat dayîn diya xwe, bi amadebûna qurbanan û kesahiyên ramyarî (siyasî). Rasthatina bi diya xwe, Fatma Muhammed Hama Salih, re gelek bi kelecana (heyecana) bû. Piştî, ev xort û her du malbatên wî yê farisî û kurdî, ji aliyê serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, hatin pêşwazî kirin.

(TVyên kurdî, pukmedia.com, netkurd.com, 03 û 04.12.2009)

FÎLMEK LI SER NIJADKUJIYA HALABCA LI ÎTALYA

Di 01 Kanûn 2009 de, filmeke belgeyî li ser êrîşkirina bajarê Halabca bi çekên şîmîk di 1988 de di Kongreya ji bo Rakirina Çekên Têkdana Girseyî de, ku du rojan li Italya hat kirin, hat nîşan dan.

Serokê Rêxistina Qurbanên Êrîşa bi Gaz a Halabca, Luqman Abdulqadir, got ku vê filmê « *beşdar di bin şok e hiştin* ». Jimareke mezzin ji şaredar û kesahiyên ramyarî yê ji aliyên cihê yê cihanê beşdarî vê kongrê bûn. Wan xwest ku alîkariya ji nuh de avakirina Halabca bikin. Şaredarê Halabca ji ajansa Aknews re got ku ev kongre gava pêşîn e û ku kongreyeke din ji bo heman amancê ewê li New Yorkê di 2010 de bibe.

(aknews.com, 08.12.2009)

KONGREYA 2mîn A FILLEYAN LI HEWLÊRÊ

Di 03 Kanûn 2009 de, Encumena Neteweyî ya Kildanî, Suriyanî û Asûriyan kongreya xwe ya 2mîn li Hewlêrê, bi amadebûna konsulê Amerîka li Bexdadê, alîkarê konsulê Rûsya li Hewlêrê, parlementerê Kurdistanê li parlamenta fêdêral a Bexdadê, Sadî Berzencî; parêzgarê (walî) Hewlêrê, Newzad Hadî, û jimareke mezzin ji nimînendeyên rêxistinên fille û kesahiyên ramyarî, bû.

Kongre li bin duruşma (slogan) « Otonomî garantiya neteweyî ya jiyana me ya hevrayî li niştiman e » hat kirin. Serokê vê encumenê, Cemîl Zîtû, di axaftina xwe de got ku rola berpirsiyarên ramyarî yê kurd di

stendina Filleyan a mafên xwe de mezzin e. Mîrza Berzencî got ku li Kurdistanê Fille di aştiyê de dijîn, lê ku li herêmên din ên Iraqê ew rastî êrîşên têrrorist dibin û ji ciyên xwe tên qewirandin.

Kongrê du rojan ajot.

(pukmedia.com, 03.12.2009)

ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN KURDISTANÊ YÊN EREBKIRÎ

Zarokekî serjêkirî li Şengalê

Di 04 Kanûn 2009 de, laşê serjêkirî yê nûgihayekî 15 salî, Nasir Reşîd Qasim, li navçeya erebkirî ya Şengalê (Sincar), ku tê de Kurdên Yezîdî dimînin, hat dîtin. Ew yek ji 3 xwendekarên ku di wê rojê de hunda bû bûn. *(rudaw.net, 06.12.2009)*

Bombeyek li Kerkûkê

Di 14 Kanûn 2009 de, bombeyeke plastîkkirî û li ser erebeyeke polîsekî çespanî (zeliqî) li taxa Rehîmawa, li Kerkûkê, teqiya. Serbazekî (esker) kurd mir û du kesên sîvîl birîndar bûn.

(peyamner.com, 15.12.2009)

Du laş li Kerkûkê

Di 19 Kanûn 2009 de, polîsê Kerkûkê daxuyand ku laşên du rûniştevanên taxa Hecacê, li Kerkûkê, hatin dîtin. Ev yek du roj piştî revandina qurbanan bû. Laşên wan bi beran (gulle) qulkirî bûn. Ew hatin birin nexweşxana Azadî.

(pukmedia.com, 19.12.2009)

3 birîndar li Kerkûkê

Di 22 Kanûn 2009 de, berpirsiyarekî ewlehiya Kerkûkê daxuyand ku bombeyek li ser ereba efser (zabit) Ahmed Abdulxeffar, li nêzîkî bingeha polîs a Reşad, teqiya. Ew û du zêrevanên wî birîndar bûn. Erebeyên din jî gelek hatin têk dan (xerab kirin).

(peyamner.com, 22.12.2009)

4 mirî û 18 birîndar li Duzê

Di 27 Kanûn 2009 de, bombeyek li qezayê Duzê, ku girêdayî Kerkûkê ye, di dema merasîmeke cêjna şîyan (aşûra) de teqiya. 4 kes hatin kuştin û 18 jî birîndar bûn. *(pukmedia.com, 27.12.2009)*

Êrîş li nêzîkî Mûsilê

Di 25 Kanûn 2009 de, êrîşeke xwekuj li dijî karwaneke hêzên pêşmergan, li nêzîkî qezayê Rebîyyê, li nêzîkî Mûsilê, bû. Efserek (zabit) hat kuştin û 15 birîndar bûn. *(pukmedia.com, netkurd.com, 25.12.2009)*

3 GORÊN HEVRAYÎ : 185 LAŞ



Di 07 Kanûn 2009 de, 3 gorên hevrayî li nêzîkî gundê Topzawa, li Rojavaya Kerkûkê, ji aliyê yaneyeke (êkîp) wezaretê iraqî ya mafên mirov û wezaretê kurdî ya Şehîdan, bi amadebûna serokê encumena parêzgeha Kerkûkê, Rizgar Elî, hat dîtin.

Ev gor ji dema Saddam Huseyn de ne û tê de bi piranî laşên zarokên kurd hene. Di gora pêşîn de 105 laş, di ya 2mîn de 52 û di ya 3mîn de 28 laş hene.

Wezîrê kurd bangî UNê (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) kir ku were seredana van gorên hevrayî yê kurdî. Laş hatin birin nexweşxana Azadî.

Pukmedia.com, aknews.com, 08.12.2009;
peyamner.com, pukmedia.com, 19.12.2009

SEREDANA WEZÎRÊ AMERÎKÎ YÊ PARASTINÊ



Di 12 Kanûn 2009 de, piştî seredaneke Bexdadê, wezîrê amerîkî yê parastinê, Robert Gates, çû Kurdistanê û tê de rastî serok Mesûd Berzanî hat.

Di vê civînê de, ji aliyê kurdî wezêrên pêşmerge û hundir, serokê Ajansa Ewlehiya (emniyyet) Herêma Kurdistanê û berpirsiyarên din ên ramiyarî (siyasî) jî amade bûn. Ji aliyê amerîkî, balyozê (sefîr) amerîkî Christopher Heel, general Jacoby û berpirsiyar û karbidestên (me'mûr, muwazzaf) wezaretê parastinê û balyaxxana amerîkî li Iraqê.

Mîrza Gates got ku amanca seredana wî spasîkirina serok Berzanî ji bo xebata wî li ser dengdana zagona hîlbijartinan li Iraqê ye (li bultena me ya buhurî binêre). Wî dilniya (te'kîd) kir ku serok û cîgirê serokê amerîkî soz da ku di 3 waran de alîkariya xwe pêşkêş bikin :

1 – Çarekirina pirsên ku di navbera hukûmeta iraqî û ya Kurdistanê Iraqê de li ser navçeyên erebkirî, ku ji wan Kerkûk, hene. Ev yek li ser bingeha bend 140 a destûra iraqî (li bultenên me yê buhurî binêre).

2- Ajotina (dewamkirin) alîkariya hêzên pêşmerge û leşkerê iraqî di warê ewlehiyê de.

3- Piştgiriya pêvajoya (processus) jimartina gelheya Iraqê di 2010 de.

Robert Gates ji Mesûd Berzanî re vexwendina (dawetkirin) serokê amerîkî Barak Obama ku biçe seredana Amerîka ragihand.

TV, çapemenî û malperên kurdî, 12.12.2009

PÊŞANGEHEKE BAZARGANIYÊ YA NEVNETEWYÎ

Di 13 Kanûn 2009 de, pêşangeheke bazarganiyî ya navneteweyî ji bo pîşesaziyan (sînaet, endustrî) kevir û sêramîkê li Hewlêrê, bi amadebûna wezîrê kurd ê şaredarî û tûrîsmê, Semîr Abdullah, û parêzgarê Hewlêrê, Newzad Hadî, hat vekirin.

262 şirketên ji 14 welatan, ku ji wan 200 ji Tirkîyê, beşdarî wê bûn. Ewê 10 rojan bajo. Ji 2005 de, 25 pêşangehên navneteweyî li vî bajarî hatine pêk anîn.

pukmedia.com, 13.12.2009

SERMAYEDAREKÎ KURD XELATEKÊ LI OTRÎŞÊ DISTÎNE



Di 13 Kanûn 2009 de, bi merasîmeke mezzin, sermayedarê kurd û xwediyê Korek Telekom, Sîrwan Berzanî, li Vyenna, li Otrîşê (Avusturya, Nêmsa), Xelata Rêxistina "Europe Business Assembly" stend. Buroya sereke a vê rêxistina ewropî ya kevn li Londonê ye û ew ji aliyê jimareke akadêmîkên ewropî tê bi rê ve birin. Rola wê destnîşandana sermayedarên pêşketî li hemî cihanê ye. Xelata Sîrwan Berzanî jê re ji aliyê Profêssor John W.A. hat dayîn.

KTV, rudaw.net, avestakurd.net, 14.12.2009

KURRÊ SEROKÊ FILISTÎNÊ LI KURDISTANÊ

Di 14 Kanûn 2009 de, serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, pêşwaziya kurrê serokê filistînî, Yassêr Mehmûd Ebbas, û şandeya (délégation) pê re kirin. Mêvan got ku ew li ser daxwaziya bavê xwe, Mehmûd Ebbas, hatiye û ku amanca seredana wî xurtkirina pêwendiyên di navbera her du aliyên e.

(KTV, peyamner.com, 14.12.2009)

ŞANDA HUKÛMETA KURDISTANÊ LI AMERÎKA

Di 19 Kanûn 2009 de, şandeya hukûmeta Kurdistanê Iraqê çû Washington, Detroit û Michiganê, li Amerîka. Ew ji serokê kabîna serokê Kurdistanê, Fuad Huseyn; serokê buroya serokê Kurdistanê ji bo pêwendiyên derve, Fellah Mustafa, û nimînendeyê hukûmeta Kurdistanê li Amerîka, Qubad Talabanî, pêk hati bû.

Şandeyê rêzeyeke rasthatinan bi berpirsiyarên fermî yê Saraya Sipî û endamên Kongrêse kir. Giftûbêj (munaqêşe) li ser rewşa nuha ya Iraqê û mēkanîsmên avakirina Iraqa fêdêral û dēmokratîk bûn. Şandeya kurdî israr kir ku ewê hevkarîya di navbera hukûmetên amerîkî û Kurdistanê Iraqê de ji bo pêşveçûna pêvajoya ramyarî û bicîkirina aşîti û ewlehiyê li Iraqê gelek girîng be.

(pukmedia.com)

Fuad Huseyn ji Radyoya Amerîka, beşa kurdî, re daxuyand ku siyaseta Amerîkiyan li hemberî Bexdad û Herêma Kurdistanê zelaltir bûye, ku wan soz da ku ji bo çarekirina pirsên berê sala 2011 (mêjuya xwekişandina leşkerê amerîkî) alîkarî bikin û tecrube bikin ku bend 140 bê bi cî anîn (li ser Kerkûk û navçeyên din ên erebkirî).

(rudaw.net, 21.12.2009)

Şandeyê rastî endamên civaka sermayedaran, a “think tanks” û mēdyayan jî hat. Li Detroit û Michiganê, ew rastî endamên civakên kildanî, asûrî û suryanî hat.

(peyamner.com, 23.12.2009)

SADDAM HUSEYN DIXWEST KU IRAQ Î TIRKIYE BI HEV RE KURDAN QIR BIKIN

Di Kanûn 2009 de, balyozê (sefir) berê yê tirk li Iraqê di salên 1986-1989 de û danişmendê (muşawir) serokê

berê yê Tirkiyê Turgut Özal, Nuzhet Kandemir, di bernamêyeke tēlêvîzyona tirkî ya fermî TRT de got ku serokwezîrê iraqî yê wê gavê, Tariq Ezîz, jê re goti bû ku Saddam Huseyn bawer e ku Kurd di heman (eynî) demê de ji bo Iraq û Tirkiyê bela ne û ku ji bo vê yekê ev her du welat divên ku bi hev re kar bikin ji bo ku serhildana kurdî bipelixinin.

Dema ku Kandemir ev pêşniyar ragihand serok Özal, ew gelek hêrs bû.

(netkurd.com, 20.12.2009)

Serok Turgut Özal nîv kurd bû û dixwest ku pirsê kurdî li Tirkiyê çare bike. Lê ew bi awakî ne zelal hat kuştin.

(Buroya Kurdî, 20.12.2009)

KONFÊRANSEKE KURDÎ-EREBI LI SER MAFÊN SÎVÎL

Di 22 Kanûn 2009 de, li Hewlêrê konferansa pêşîn a li ser avakirina Sazandeya Kurdî-Erebî ji bo Mafên Sîvîl, bi amadebûna serokê parlamenta Kurdistanê Iraqê, Dr. Kemal Kerkûkî, dest pê kir.

Nimînendeyên ji 60 rêxistinên bêtir, ku ji hemî Iraqê hati bûn, beşdarî wê bûn.

(peyamner.com, 22.12.2009)

SEROKÊ DEWLETÊ YÊ BRÎTANÎ LI KURDISTANÊ

Di 23 Kanûn 2009 de, piştî seredana Bexdad û Basra, wezîrê dewletê yê brîtanî ji bo karên derve, Ivan Lewis, rastî serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî; serokwezîr Behrem Salih û kesahiyên ramyarî yê din hat. Balyozê amerîkî li Iraqê, John Jenkins, jî pê re bû. Amanca seredanê piştgiriya pêvajoya dēmokratîk û giftûbêjkirina pêwendiyên dualiyî bû.

(pukmedia.com, peyamner.com, 23.12.2009)

QEDEXEKIRINA HILGIRTINA ÇEKKAN

Di 29 Kanûn 2009 de, birêvebirê karên hundirî yê parêzgeha Suleymaniyê daxuyand ku hukûmeta Kurdistanê Iraqê hilgirtina her celeb çek, eger bi destûr yan bê destûr bin, bicarek qedexe kir û ku bitenê hêzên ewlehiyê mafê wan heye ku wan hilgirin.

(pukmedia.com, netkurd.com, 30.12.2009)

KURDISTANA ÎRANÊ

14 KES LI SINÊ TÊN RAGIRTIN

Di 05 Kanûn 2009 de, 14 çalakvan û endamên Encumena Koordinasyona Karkeran li mîtîngêkê, li nêzîkî bajarê Sinê (Sanandaj), li Kurdistana Îranê, hatin ragirtin. Piştê, 3 ji wan hatin azad kirin, lê dadmend ferman da ku ên din jî, li hemberî dayîna her yek ji wan 100.000 dolaran bên berdan.

DU HUKMÊN ÎDAMÊ

Di Kanûn 2009 de, li gora dadgeha leşkerî ya Urmîyê, Kurdek, Mohammad Amîn Agûşî, ku li Pîranşahrê dimîne, û Azeriyek, Irec Mohammadî, ku li Miyanduawê rûdinê, piştî ragirtina xwe di 2009 de hukmê îdamê stend. Ew bi tehdîdkirina ewlehiyê hatine tawanbar (bi sûc) kirin.

Berê du salan, Agûşî cardin, tevî du kesên din, Ahmad Pûlaxanî û Iraj Mohammadî, hati bû ragirtin, lê piştê hati bû berdan.

(hra-iran.org, 06.12.2009 ; rizgari.org, 07.12.2009)

ÎDAMKIRINA KURDEKÎ 17 SALÎ

Di 17 Kanûn 2009 de, Kurdekî 17 salî, Muslih Zeman, bi fermana dadgeha Sinê, ji bo ku pêwendiyên wî yên evînî bi keçekê re hebûn, hat îdam kirin !

(peyamner.com, 16 û 17.12.2009)

SÊ KURD TÊN TAWANBAR KIRIN

Di Kanûn 2009 de, li gora dadgeha leşkerî ya Urmîyê, sê Kurd hatin tawanbar kirin : Resûlpûr, ku bi navê Resûl Şele hatiye nasîn, bi 6 sal zîndan. Xalid Ahmediyan, ji Pîranşahrê, bi 7 sal, û nivîskar Hasan Serdarî, ji Kirmanşahê, bi 3 sal.

(rizgari.org, 07.12.2009)

DU KURD TÊN REVANDIN

Di 07 Kanûn 2009 de, xwendekarekî kurd ê çalak (aktîf), Suhrab Karîmî, ji aliyê hêzên ewlehiyê yên îranî hat ragirtin. Nûçegihanê Çavdêriya Mafên Mirov li Kurdistanê daxuyand ku ew hat birin ciyekî nenas. Karîmî di 2007 de li zanîngeha Tehranê hati bû ragirtin. Piştî 76 roj zîndan, ew li hemberî dayîna 150 milyon tumanan hati bû berdan.

Xwendekarekî din ê kurd li zanîngeha Tehranê, Ferzad Kelb Alî, jî ji aliyê hêzên ewlehiyê hat revandin. Ew xwendekarekî gelek jêhatî ye û doktora di zanînen ramiyarî û civakî de amade dikir.

(avestakurd.net, 09.12.2009)

NAVÊN KURDÎ TÊN QEDEXE KIRIN

Desthilatên îranî ji dê û bavên kurd re qedexe kir ku navên kurdî bidin zarokên xwe. Loma, ev zarok du navên wan hene, yekî kurdî yên ne fermî û yekî fermî yê şî yan farisî, weka Mohammad, Alî, Fatima, Zahra, Meryem ... Ronakbîrên kurd dibêjin ku navên sunnî jî, weka Umer, Ebû Bekir, Usman ... jî hatine qedexe kirin.

Karbidestekî qeydbûna xelk li Mahabadê ev nûçe rastand û got ku ew ne bitenê ji bo Kurdan, lê ji bo Belûç, Tirkmen û Ereban (sunnî) jî qedexe ye.

(rudaw.net, 24.12.2009)

KURDISTANA SÛRIYÊ

ROJNAMEVANEK TÊ RAGIRTIN

Di 22 Teşrîn 2009 de, rojnamevanê kurd Ma'n Aqil li buroya xwe ya rojname fermî "El-Watan", li Şamê, hat ragirtin. Du roj şûn de, ew ji karê xwe hat avêtin.

Par, servîsên dîzî yên sûrî ew aciz kiri bû, ji bo ku wî rexneya hukûmetê kiri bû. Ji berê jî, di 1987 de, ji sedema endambûna wî Lîga Tevgera Kommûnîst, partiyeke ku wê demê qedexe bû, ew aciz kiri bû.

(azady.nl, 15.12.2009)

NIVÎSKAREK TÊ RAGIRTIN

Di 12 Kanûn 2009 de, servîsên dîzî yên sûrî nivîskarê kurd Mustafa Ismaîl, ji bo ku ew li ser malperên entêrnêtê dinivîse û beşdar dibe bernameyên têlêvîzyona kurdî, hat ragirtin.

Ismaîl li Kobanî (Eyn El-Arab), li Kurdistana Sûriyê, dimîne. Ew parêzer (avukat), çalakvan û nivîskar e. Çend roj berê ragirtina xwe, wî gotarek nivîsî bû û tê de goti bû ku bi hinceta (munasebet) Roja Navneteweyî ya Mafên Mirov, şaxa Helebê ya servîsên dîzî yên satêlîtan ji bo jêpîrsînekê bangî wî kiri bû. Rêxistinên kurdî li hundir û derveyî Sûriyê kampanyek ji bo azadkirina wî ajot.

(rudaw.net, avestakurd.net, 14.12.2009)

XWENDEKAREK TÊ RAGIRTIN

Di 14 Kanûn 2009 de, xwendekarekî kurd, Hivraz Muhammed Emîn Hesên, ji aliyê hêzên ewlehiyê li Ramela, tevî hûrûmûrên xwe yên şexsî, bê tu ravekirin hat ragirtin.

Rêxistina kurdî ya mafên mirov li Sûriyê, DAD, ev tevger tawanbar kir û anî bîran ku hukûmeta sûrî zagona (qanûn) sûrî ya li ser mafên bingehî, ku di 1973 de hati bû derxistin, û zagonên peymanan navneteweyî, yê li ser mafên welatvan û mafên ramyarî, ku di 1976 de hati bûn derxistin, dipelixîne. Li gora rappora Amnesty International, ji 1500 kes bêtir di 2007 de û bi sedan kesên din di salên piştî wê de hatine ragirtin. (azady.net, Eukurd.net, 18.12.2009; rudaw.net, 24.12.2009)

CARDIN SERBAZEKÎ KURD TÊ KUŞTIN

Di 19 Kanûn 2009 de, cuhaneke kurd, Izzeddîn Moro, ji navçeya Kobanî (navê erebkirî : Eyn El-Arab), di dema xizmeta leşkerî de hat kuştin. Ji dema serhildana kurdî ya 12 Adar 2004 de, ew serbazê kurd (esker) ê 34mîn e ku tê kuştin. ([DAD, rudaw.net](http://DAD.rudaw.net), 24.12.2009)

4 RAMYARIYÊN KURD TÊN RAGIRTIN

Di 26 Kanûn 2009 de, 3 endamên komîta siyasî ya partiya kurdî “Yekîtî”, Hesên Salih, Muhammed Mustafa, Marûf Melle Ehmed, û çalkvan û hunermend Dijwar Naso, li Qamişlî hatin ragirtin. Ev yek piştî kongra 6mîn a vê partiye ku tê de wê “otonomî”yê ji bo Kurdên Sûriyê xwest. (avestakurd.net, 27.12.2009)

AVAKIRINA TEVGEREKE RAMYARÎ YA KURDÎ

Di 30 Kanûn 2009 de, 8 partiyên ramyarî (siyasî) yê Kurdên Sûriyê tevgerê bi navê “Civata Siyasî ya Kurdî li Sûriyê” ava kir. Ev partî ev in : Partî Dêmoqrati Kurd li Sûriyê (El-Partî), Partiya Çep a Kurdî, Yekîtî, Şepela Pêşerojê, Partiya Demokrat a Niştimanî ya Kurdî, Partiya Azadî, Partiya Demokratî ya Kurdî li Sûriyê, Partiya Yeksanî ya Demokratîk a Kurdî. (pukmedia.com, avestakurd.net, 31.12.2009)

NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

RÊXISTINÊN NE HUKÛMÎ YÊN RÛSÎ LI NAVENDA KURDÎ YA AGAHDARIYÊ LI POLONYA

Di 26 Teşrîn 2009 de, rêxistinên ne hukûmî « NGO » yê rûsî çûn seredana Navenda Agahdarî û Belgeyan a Kurdî li Polonya.

Seredan bi filmeke belgeyî li ser vê navenda ku di 2003 de bi înişyatîva Ziyad Reûf, ku nuha nimînendeyê Hukûmeta Herêma Kurdistanê Iraqê (KRG) li Polonya ye, mamosteyên zanîngêhen polonî û Elî Xefûr, kevntirîn Kurd li Polonya, hati bû ava kirin. Ev navend paşhatiyê Rêxistina Hevaltiya Polonî-Kurdî, ku di 1992 de li Krakovî hati bû ava kirin, e.

Ev seredan di çarçeva projeyeke demdirêj, bi navê “The activation of transborder youth initiatives from countries of Central and East Europe” (Jîndarkirina înişyatîvên derveyî sînoran ên cuhane ji welatên Ewropa Navendî û Rojhilatî), hat kirin. (Krg-Polonya, 04.12.2009)

DÎTINA GOREKE KEVNAR LI KURDISTANA IRAQÊ

Yaneyeke (équipe) arkêologên biyanî goreke ji hezar salên Berê Zayîne de, li nêzikî navenda Hewlêrê, dît. Hewlêr weka kevntirîn bajarên cihanê ku bê rawestan tê de mirov jiyane hatiye nasîn. (azady.nl, pukmedia.com, 01.12.2009)

RÊXISTINA KURD-KAZAKISTAN LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 08 Kanûn 2009 de, wezîrê çandê yê Kurdistanê Iraqê, Mehmûd Şakir, pêşwaziya şandeyeke rêxistina Kurd-Kazakistan û Fêdêrasyona Xwendekar û Cuhane Kazakistanê kir.

Şandê got ku rewşa îro ya Kurdistanê serxwebûna ku Kazakistanê di 1991 de stendi bû anî bîra wê. Her du aliyan xurtkirina pêwendiyên xwe giftûbêj kir û, li dawiyê, şandê al, amblêm û cillekî neteweyî yê Kazakistanê pêşkêşî wezîr kirin. (peyamner.com, 08.12.2009)

XELAT JI DU FÎLMÇÊKERÊN KURD RE

Tokyo

Di Kanûn 2009 de, filmçêkerê navdar ê kurd ê Îranê, Behem Qobadî, bi filma xwe "Bila tukes li ser pisîkên Îranê nepeyive" beşdar bû Fêstivala Fîlmê ya Tokyo, li Japonê û Xelata taybetî ya juriyê stend. Ji berê jî, filçêker xelatên cihê yên navneteweyî ji bo filmên din stendi bûn (li bultenên me yên berê binêre).
(netkurd.com, pukmedia.com, 07.12.2009)

Dubay

Di Kanûn 2009 de, filmçêkerê kurd ê Iraqê, Şewket Emîn, Xelata taybetî ya rûmetê (şeref) li Fêstivala Fîlmê ya Dubay, li Mîriyên Erebi yên Yekbûyî, ji bo filma xwe "Şûnek bo Yarı" (Derek ji bo maça futbolê), stend.
(avestakurd.net, mediakurd.com, 17.12.2009)

FÎLMEKE BELGEYÎ LI STOKHOLMÊ

Di 06 Kanûn 2009 de, Rêxistina Xwendekar û Akadêmîkên Kurd li Swêdê filmeke belgeyî li ser nijadkujiya Dersîmê di 1938 de, li zanîngeha Stokholmê, nîşan da.

Di destpêkê de, cîgirê serokê rêxistinê, Serhat Daran, axaftinek li ser dîroka vê nijadkujiya ku bi fermana Atatürk û dora wî hat kirin kir. Piştî, filmeke belgeyî ku ji katjmêrekê (saetek) bêtir ajot hat nîşandan. Gîftûbêj nemaze bi swêdî bûn.
(netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, 07.12.2009)

HELBESTVANÊN DANIMARKÎ LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 10 Kanûn 2009 de, di şeveke ku ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd ên Duhokê hati bû amade kir de, helbestvanên danîmarkî helbest, stran û muzîka welatê xwe pêşkêş kirin. Helbestvanên kurd û iraqîyên ereb jî berhemên xwe gotin.

Fewzî El-Etrûşî (kurd), alîkar li wezaretê iraqî ya çandê, daxuyand ku ev şev di çarçeva hevkarîya çandî di navbera her du wezaretên çandê yên Bexdad û Hewlêrê de hat pêk anîn. Û wî got jî ku şevên weha ewê li Hewlêr û Suleymaniyê jî bên kirin.
(pevamner.com, 11.12.2009)

LI MEKKE Û MEDÎNÊ, 109 DESTNIVÎSÊN KURDÎ YÊN JI BERÊ 200 SALAN

Di Kanûn 2009 de, birêvebirê navenda „Jîn“ê li Kurdistanê Iraqê, Refîq Salih, daxuyand ku dema ku ew ji bo heccê çû bû Erebîstana Suûdî, çû du pirtûkxaneyên Şah Abdul-Ezîz, Mecîd Nebewî Şerîf û Muteherrem, li bajarên Mekke û Medîne. Wî tê de 109 destnivîsên ku ji aliyê zanayên kurd berê 200 salan hati bûn nivîsîn dîtin û ew qeyd kirin CDyan. Tê de navên kurdî (goranî, şarezûrî, dînerewî, amêdî, sincarî) û destnivîsên li ser terîqeta kurdî ya Neqşbendî dîtin. Û wî got jî ku wî

nikarî bû lêgerînên din bike, ji bo ku zemanê wî ne ma bû, lê ku ewê careke din vegere wan deran.
(pukmedia.com, 16.12.2009)

ÇANDA KURDÎ LI ZANÎNGEHA EL-EZHER, LI QAHIRÊ

Muhtiyê Misrê, Dr. Elî Cum'a, biryar stend ku çanda kurdî bixe bernameyên Zanîngeha olî El-Ezherê, li Qahirê. Ev yek piştî seredana şandeyeke olî (dîni) ya Kurdistanê Iraqê Şêxê El-Ezherê, Muhtiyê Misrê û berpisiyarên vê zanîngehê.

Şandeya kurdî ji wezîrê weqfên olî, serokê encumena weqfan û karên olî li parlamenta Kurdistanê Iraqê û çend mamosteyên olê hati bû pêk anîn. Ew çû seredana xwendekarên kurd ku li zanîngeha El-Ezherê dixwînin.
(rûdaw.net, 16.12.2009)

MUZÎKVANEKÎ KURD LI CHICAGO BAWERNAME DISTÎNE



Di 19 Kanûn 2009 de, muzîkvan Nebez Hama Reşîd, ji Kurdistanê Iraqê, bawername (diplôme) „Master degree“ di muzîkê de li yek ji zanîngehên Chicago, li Amerîka, stend.
(pukmedia.com, 19.12.2009)

FÊSTIVALA FÎLMA KURT LI KURDISTANA IRAQÊ

Di 20 Kanûn 2009 de, Fêstivala 2mîn a Fîlma Kurt li Suleymaniyê dest pê kir. Piştî axaftina wezîrê çandê, Kawe Mehmûdî, û ya birêvebirê giştî yê fêstivalê, Azad Sewze, filma „Şûnek bo Yarı“ ya filmçêker Şewket Emîn, hat nîşan dan. Ewê 28 fîlm, ji bo stendina Xelata Xezala Zêrîn, bên nîşan dan.
(pukmedia.com, avestakurd.net, 21.12.2009)

ŞAMPYONÊ CIHANÎ YÊ KARATÊ XORTEKÎ KURD E

Di Teşrîn 2009 de, li Roma 7mîn yariya (musabaqa) navneteweyî ya karatê bû. Xortekî kurd ê 16 salî, Şiyar Bagatarhan, ji Çewlikê, Kurdistanê Tirkîyê, Xelata

1mîn stend. Şiyar tevî malbata xwe li Neuchatelê, li Swîsra dimîne.
(avestakurd.net, 28.12.2009)

LIHEVKIRINEK DI NAVBERA ZANÎNGEHEKE KURDISTAN IRAQÊ Û ENSTITUYEKE FRANSÎ DE

Di 30 Kanûn 2009 de, Zanîngeha Salaheddînê li Hewlêrê lihevkarîyê bi Enstituya Fransî ya Ziman û Çandên Rojhilata Navîn re wajo (imza) kir. Ev

yek, bi amadebûna serokê parlamenta Kurdistanê, Dr. Kemal Kerkûkî; alîkara konsulê Fransa li Hewlêrê, Murielle Poirot, û serok û endamên encumena perwerdeya bilind li Kurdistana Iraqê.

Li gora vê lihevkarîyê, xwendekarên fransî ku bakalorya, master yan doktora dixwînin ewê karibin beşek ji lêkolînên xwe li zanîngeha Salaheddînê bikin.
(peyamner.com, pukmedia.com, 31.12.2009)

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPS-COMMISSIE



Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.